# Zanîna van baş e

Gava yekem
Demên vekirinê / Rojên bînvedanê
Destûrnameya mayînê û hemwelatîbûn
Sîgorteya berpirsyariyê ya taybet
Alkol / Tûtin / Hişbir
Ajalên kedî
Li Swîsreyê jiyana bi hev re

# Gava yekem

Hûn nû hatine Kanton Basel-Stadt? Wê demê, divê hûn di nav 14 rojan de li ba Saziya Qeydkirina Nişteciyan qeyda xwe çêkin. Kesên nû bar kirine û hatine, gava serlêdana qeydê li ba Saziya Qeydkirina Nişteciyan dikin, ev sazî bi wan re axavtineke şexsî ya bixêrhatinê dike.

## Qeydkirina fermî

Hemû kesên nû bar kirine, hatine Kanton Basel-Stadt, divê xwe di nav 14 rojan de li ba Saziya Qeydkirina Niştecîyan a ciyê lê rûdinin (Basel, Riehen an Bettingen) bidin qeydkirin.
Hûn ji Swîsreyê yan ji welatekî Yekîtiya Ewropayê (YE) yan ji welatekî EFTAyê hatine:
Hûn dikarin xwe yan bi nivîskî, bi riya E-barkirin CH (E-Umzug CH) an jî bi şexsê xwe li ba Saziya Qeydkirina Niştecîyan a li Basel-Stadt, li Riehen an li Bettingen bidin qeydkirin.
Hûn ne ji welatekî-YE an welatekî-EFTAyê hatine:
Ji kerema xwe werin ba Saziya Qeydkirina Niştecîyan (Einwohneramt) a li Navenda-serdanêran a Spiegelhofê (Kundenzentrum Spiegelhof). Divê em li wê derê agahiyên we yên biyometrîk bistînin. Divê hûn heqdestê qeydkirinê bidin.
Navnîşan ev e:
Kundenzentrum Spiegelhof
Spiegelgasse 6
4001 Basel
Tel. 061 267 70 60
Ji bo qeydkirinê ji we re çi lazim e?
Ji kerema xwe, ji pêş de xwe baş agahdar bikin, bê divê hûn kîjan belgeyan bi xwe re bibin.
Divê belge bi almanî, fransî, îtalî yan jî ingilîzî bin.
Di her rewşê de pêdiviya we bi van belgeyan heye:

- Forma qeydkirinê (Anmeldeformular). Divê hûn forma qeydkirinê ji berê ve dagirin.
- Kopiyeke rengîn a pasaport an nasnameya we (ji bo YE/EFTA) ya derbasdar.
- Kopiyeke peymana kirê, yan nasnameya malê.

Dibe ku pêdiviya we bi van belgeyan jî hebe:

- Vîze
- Peymana kar
- Ravekirina qeyda (hebûn an nebûna) sûc
- Deftera (şahidiya) zewacê
- Hîn zêdetir

Ger hûn di nav kantonê de bar dikin an jî ji kantona Basel-Stadt bar dikin, divê hûn di her şertî de vê yekê ji saziya qeydkirina niştecîyan re bibêjin.
Hûn ne ji welatekî-YE yan ji welatekî-EFTAyê ne, lê belê hûn ji xwe li Swîsreyê dijîn:
Di rewşa guhertina kantonekê de berî hûn bar bikin, werin kantona Basel-Stadt, erêkirina Saziya Koçberiyê bistînin. Qeydkirin tenê piştî wê dikare pêk were.

## Axavtina bixêrhatinê

Gava hûn ji bo qeydkirinê biçin Saziya Qeydkirina Nişteciyan, axavtineke şexsî pêk tê. Em bixêrhatina we dikin, bersiva pirsên we didin û we li ser jiyana li Baselê agahdar dikin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/gava-yekem

# Demên vekirinê / Rojên bînvedanê

Li Swîsreyê piraniya dikanan roja yekşemê girtî ne. Firoşgehên li stesyonan (Bahnhof) û neftxaneyan (benzînxane) derveyî vê ne. Rojên bînvedanê yên fermî ji aliyê kantonê ve tên diyarkirin.

## Rojên bînvedanê

Rojên bînvedanê li gor zagona kar hatine diyarkirin û bi awayê hiqûqî bi rojên yekşeman re wekhev hatine hesibandin. 1ê Tebaxê roja cejna netewî (Nationalfeiertag) li giştiya Swîsreyê bînvedana fermî ye. Bi ser de her kanton dikare rojên din ên bînvedana fermî diyar bike Li kantona Basel-Stadt ev rojên li rêzê wek rojên bînvedanê tên pejirandin: Sersal (1ê Çile), Roja îna bi xêr (îna berî cejna hêkan), Cejna hêkan, Roja cejna karkeran (1ê Gulanê), Roja çûna jorê ya Îsa (pêncşema 40 rojên piştî yekşema cejna hêkan), Vegera Îsa, Roja cejna netewî (1ê Tebaxê), Noel (25ê Kanûnê), Roja Stephan (26ê Kanûnê).

## Demên vekirina dikanan

Demên vekirina dikanan li gor kantonan cuda ne. Li kantona Basel-Stadt dikan dikarin ji duşemê heta înê saet ji 6.00 heta 20.00an vekirî bin. Lê dem dikare li gor her dikanê were guhertin û kintir be. Roja şemiyê piraniya dikanan ji rojên nav hefteyê zûtir tên girtin; piranî saet 18.00an. Roja yekşemê piraniya dikanan girtî ne. Dikanên li stesyonan (bahnhofan), li neftxaneyan (benzînxaneyan) an dikanên taxan bi gelemperî heft rojan vekirî ne û piranî ji yên din tevan zûtir tên vekirin û derengtir tên girtin.

## Demên vekirinê yên birêvebiriya fermî

Birêvebiriya kantonê bi gelemperî ji duşem heta înê saet ji 8.00 heta 12.00an û ji 14.00 heta 17.00an vekirî ye. Hinek cî piştînîvro saet 13.30 vedibin an xwegihandina bi riya telefonê demdirjtir e. Tê pêşniyarkirin, ku xwe ji berê ve bi riya telefonê yan e-mailê bidin agahdarkirin, bê pêşwazîgeh (şalter) kengî vekirî ne.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/oeffnungszeiten--feiertage

# Destûrnameya mayînê û hemwelatîbûn

Ji bo demeke dirêjtir li Swîsreyê bimînin an li vir bixebitin pêdivî bi destûrnameyekê heye. Di navbera cureyên cuda yên destûrnameyên mayînê û destûrnameyên bicihbûnê de cudayî tê kirin.

## Cureyên destûrnameyan

Kî di dema mayîna xwe ya li Swîsreyê de bixebite yan jî ji sê mehan zêdetir li vir bimîne, pêdiviya xwe bi destûrnameyê heye. Ev yek ji aliyê Saziya Koçberiyê ya kantonê ve (Migrationsamt) tê dayîn. Ewê di navbera cureyên mafê mayînê de biryarê bide, bê mafê destûra mayîna demkin (heta salekê), destûra mayîna demborî (heta demekê) û destûra mayîna bêdawî (ji bo herdem) û herwiha destûra mayîna kesên sînor derbas dikin, were dayîn.

- Destûrnameya mayîna demkin L: Ev cureyê destûra mayînê ji bo kesên bi armanceke diyar li Swîsreyê demeke kin (herî zêde salekê) bijîn, tê dayîn. Piraniya hemwelatiyên dewletên-YE û EFTAyê yên dikarin di navbera sê mehan û salekê de peymana kar (Arbeitsvertrag) nîşan bidin, daxwaza vî cureyê mafê destûrnameya mayînê dikin.
- Destûrnameya mayîna demborî B: Ev cureyê destûra mayînê ji bo kesên demeke dirêj li Swîsreyê bimînin e. Piraniya hemwelatiyên dewletên-YE û EFTAyê yên gava karibin nîşan bidin wê ji salekê zêdetir li Swîsreyê kar bikin (peymana kar-Arbeitsvertrag) daxwaza vî cureyê destûra mayînê dikin. Destûra mayînê ji bo hemwelatiyên-YE/EFTAyê ji bo pênc salan tê dayîn. Ji bo kesên ji dewletên din hatine, derbasdariya wê salek e. Piştre, divê daxwaza dirêjkirinê were kirin. Dirêjkirin wê ji bo van kesan li gor şertûmercan pêk were, wek mînak tevlêbûna kurseke almanî. Gava destûra we ya mayînê neyê dayîn, sedemên wê yên li hember dirêjkirinê werin gotin hene, wek mînak cezayên sûc an girêdayîbûna bi alîkariya civakî ve. Gava hûn ji şeş mehan zêdetir li derveyî welêt bimînin, destûra mafê mayîna we bi dawî dibe. Penaberên daxwaza wan hatine pejirandin jî destûra mayînê ya B distînin.
- Destûrnameya mayîna bêdawî C: Mirov piştî li Swîsreyê 5 an 10 salan dimîne vê destûra mayînê distîne. Li vê derê jî şertûmercên cihêreng ên ji bo mirovên ji welatên-YE/EFTAyê û welatên sêyemîn hene. Gava hûn bar bikin, biçin derveyî welêt, destûra mafê mayîna we ya bêdawî dikare di bin şertûmercên diyar de herî zêde çar salan derbasdar be. Ji bo were nûkirin, divê serlêdanek li ba Saziya Koçberiyê were kirin.
- Destûrnameya mayîna demkî F: Kesên serî li mafê penaberiyê dane lê wek penaber nehatine pejirandin, lê ji bo demekê destûr hatiye dayîn ku li vir bimînin, vî cureyê destûrê distînin. Divê ev destûrname her sal were nûkirin.

## Nasnameya biyanî

Biyaniyên li Swîsreyê rûdinin nasnameyeke biyanî (Ausländerausweis) distînin. Cureyê nasnameyê girêdayî pîvanên cihêreng e. Kesên ji derveyî welêt hatine nasnameyeke biyometrîkk a di awayê karta krediyê de distînin. Ji bo wê di dema qeydkirinê de şopa tiliyên wan tê girtin û wêneyek tê kişandin. Ger nasname were dizîn an windakirin, divê mirov bi lez serî li polîs bide. Hûn dikarin bi gilînameya windakirinê ya ji polîsan were stendin û kopiyeke pasaporta ji welêt an kopiya nasnameyê (ji bo YE/EFTA), nasnameyeke nû li ba Saziya Koçberiyê (Migrationsamt) daxwaz bikin.

## Dirêjkirin

Li gor cureyê destûra mayînê û hemwelatîbûnê, divê destûra mayînê bi navberên cuda were dirêjkirin. Gava pêdivî bi dirêjkirinê hebe, hûn formekê distînin (Verfallsanzeige). Vê formê dagirin, ji aliyê karsazê we ve bidin erêkirin û dawî tevî kopiyeke pasaporta we ya welêt an nasnameya (ji bo YE/EFTA) we, bidin Saziya Koçberiyê (Migrationsamt). Ger pirsên we hebin, Saziya Koçberiyê agahiyan dide.

## Hemwelatîbûna rewa

Kesên ji deh salan û vir ve li Swîsreyê rûdinin, dikarin serlêdana bidestxistina mafê hemwelatîbûna federalî bikin. Ji bo kesên jiyana xwe ji 8 heta 18 saliya xwe li Swîsreyê derbas kirine, her salek wek du salan tê hesibandin. Ji bo hemwelatîbûnê tişta girîng a tê xwestin; tijekirina dema rûniştinê ya diyarkirî, hînbûna zimanê almanî, integrebûn û tinebûna deyn an qeyda cezayî ye.

## Hemwelatîbûna hêsankirî

Hemwelatîbûna hêsankirî di bin hin şertûmercên zagonî yên diyar de, ji bo hevjînên biyanî yên hemwelatiyên Swîsreyê û ji bo neviyên dêûbavekî Swîsreyî vekirî ye. Ji bo hemwelatîbûna hêsankirî, Hikûmeta Federalî bi tenê xwe biryara hemwelatîbûnê dide.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/aufenthaltstitel

# Sîgorteya berpirsyariyê ya taybet

Divê her kesê gihiştî xwediyê Sîgorteyeke Berpirsyariyê ya Taybet be. Ev sîgorte, gava mirov bê hemdê xwe xisarê bide hinekan, heqê xisarê digire ser xwe.

## Berpirsyariya şexsî

Gava mirov keseke/kesekî din birîndar bike yan xisarê bide hin tiştên kesên din, mirov berpirsyarê dayîna heqê xisarê ye. Gava mirov xisar bi hemdê xwe nedabe jî, ev yek derbasdar e. Heqê xisarê dikare pir giran be. Wek mînak, gava xwe li ser berfê dişemitînin, ger hûn kesekê/kesekî birîndar bikin, heqê xisarê dikare bi sedhezaran frank be.

## Sîgorteya berpirsyariya taybet

Di rewşa xisardayînê de ji bo nekevin tengezariyên aborî pêdiviya we bi Sîgorteya Berpirsyariya Taybet (Privathaftpflichtversicherung) heye. Ev yek bi piranî ji aliyê şîrketên sîgorteyên taybet ve tê çêkirin.
Sîgorteyên berpirsyariya taybet dikarin bi piranî ji bo hemû kesên li malekê rûdinin bi hev re were çêkirin. Ev sîgorte ne mecbûrî ye, lê bi her awayî tê pêşniyarkirin.

## Fêde û xizmetên sîgortayê

Sîgorteya Berpirsyariya Taybet xisara tiştan û xisara kesan a keseke/kesekî sîgortakirî bide keseke/kesekî din, hildigire ser xwe. Wek mînak, lêçûna tamîrê, lêçûna tedavîbûnê, tazmînata windakirina mehaneyê yan jî lêçûna êşûazarê di nav de ye. Sîgorteya berpirsyariya taybet xisarên hin ajalên diyar ên kedî dibin sedem jî, digire ser xwe. Gava hûn xisarê bidin kesên di heman malê de rûdinin, sîgorte vê xisarê nagire ser xwe. Sîgorte xisarên bi hemdê xwe (bi qesd, bi zanebûn) yan ji ber îhmalkariyê tên dayîn jî nagire ser xwe.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/private-haftpflichtversicherung

# Alkol / Tûtin / Hişbir

Kî madeyên hişbir li ba xwe bigire, bi kar bîne yan bifiroşe, ew cezakirinê digire ber çav. Ji bo firotina alkol û tûtinê sînorê temen (imir) heye.

## Hişbir

Xwedîbûn, firotin û bikaranîna hişbirên derzagonî tên cezakirin. Ev ji bo tibabên biçûk jî derbasdar e. Bê kîjan made derzagonî ne di zagona madeyên hişbir/zagona narkotîkê de (Betäubungsmittelgesetz) hatiye diyarkirin. Bazirganiya firotina madeyên hişbir/narkotîk bi cezayên giran tên cezakirin.

## Alkol û tûtin

Ji bo firotina alkol û tûtinê sînorê temen heye. Bi vî awayî tiştên ji tûtinê û vexwarinên bi alkol nabe li kantona Basel-Stadt bifiroşin zarokan an ciwanên di bin 16 salî re. Ji bo vexwarinên bi alkol ên diyar û yên dijwar (spirituos) sînorê temen 18 ye.

## Qedexeya kêşana cixareyê

Qedexeya kêşana cixareyê li Swîsreyê li gor kantonan cihêreng hatiye diyarkirin. Kantona Basel-Stadt ji bo kesan ji cixarekêşiya neçalak biparêze zagonên federal û zagona cîgehên mazûvanî yên kantonî ji xwe re bingeh digire. Qedexeya kêşana cixareyê li van deran derbasdar e:

- Li cîûwarên sergirtî yên ji rayagiştî re vekirî (nexweşxane, saziyên dewletê, xwendegeh, muze, sînema, şanogeh, trên û otobus, dikan û navendên kirînûfirotinê).
- Li cîûwarên gelek kes lê kar dikin.

Biryara kêşan an nekêşana cixareyê ya li xwaringehekê, girêdayî mezinbûna wê xwaringehê ye. Li hin xwaringehan odeya taybet a kêşana cixareyê heye.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/alkohol--tabak--drogen

# Ajalên kedî

Kesên ajalên kedî bi xwedî dikin, divê rêzgirên cihêreng bi cî bînin. Wek mînak mirov nikare hin cureyên ajalan li her malê bi xwedî bike. Divê kûçik li ba kantonê werin qeydkirin.

## Xwedîkirina ajalên kedî

Kî li maleke bi kirê rûdine bi her awayî dikare ajalên biçûk ên wek berazokên gewrik, mişkê çolê, şalûl û bilbil an masiyan xwedî bike. Lê xwedîkirina ajalên mezintir (pisîk an kûçikên biçûk jî) dikare di peymana kirêkirinê de were qedexekirin. Xwedîkirina ajalên dengbilind an xetaredar jî dikare ji aliyê xwediyên xanî ve were qedexekirin. Ji bilî vê, kesên ajalên kedî xwedî dikin, divê li gor zagonên parastina ajalan tev bigerin. Wek nimûne, mirov nikare hin ajalên diyar (wek mînak kîvroşk) bi tena xwe xwedî bike. Wekî din rêzgirên divê mirov pêk bîne, yên wek mînak meziniya kefesê û birêkûpêkbûna wê, hene. Anîna Swîsreyê ya gelek ajalên kêmdîtî (ajalên exotîk) bi tevayî qedexe ye. Ji bo ajalên din, pêdivî bi destûrnameyeke taybet a Saziya Veterîneriyê/bijîjkên ajalan heye.

## Kûçik / Se

Li kantona Basel-Stadt zagoneke taybet a kûçikan heye. Di vê zagonê de berpirsyariyên kesên ajalan bi xwedî dikin, hatine diyarkirin. Bijîjkên ajalan dikarin di vê mijarê de agahiyên zêdetir bidin.

- Divê hemû kûçikên li Swîsreyê bi mikroçîpekî hatibin diyarkirin û di bankeya agahiyan de hatibin qeydkirin. Kûçik dibe xwediyê nasnameyeke kûçikan (a di awayê karta krediyê de). Ev nasname ne wek nasnameya ajalên kedî ye, ku gava mirov tevî ajala xwe diçe welatên Yekîtiya Ewropayê lazim dibe.
- Divê kûçik li ba şaredariya niştgehê were qeydkirin. Ji bo wê formeke online heye. Salê carekê baca ajalê tê stendin. Ji bo xwedîkirina her kûçikekî, divê sîgorteya berpirsyariyê (Haftpflichtversicherung) ya mecbûrî were çêkirin.
- Hemû kesên kûçikan bi xwedî dikin, divê pîsiya kûçikê xwe ji erdê rakin û biavêjin çopê. Kî vê yekê pêk neyîne, ew dikare cezayê pereyan bistîne.
- Ji bo hinek cinsên kûçikan pêdivî bi destûrnameyeke taybet heye (wek mînak Pitbull an jî Rottweiler).
- Anîna kûçikan a parkên bajêr û ciyên lîstina zarokan bi gelemperî qedexe ye. Li ser pêşkera nexşeya kantonê “Mapserver” ciyên kûçik dikarin lê serbest bigerin û ciyên şuştina kûçikan hatine diyarkirin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/haustiere

# Li Swîsreyê jiyana bi hev re

Her welat xwediyê taybetiyên çandî yên li gorî xwe ye. Li Swîsreyê jî hin awayên danûstendinên irfûadetî yên divê hûn nas bikin hene.

## Çandên cuda

Li Swîsreyê çand û bîrûbaweriyên cuda hene. Li vê derê çar zimanên cuda yên welêt jî hene. Tiştekî li aliyê Swîsreya almanî ji rêzê be, ew dikare li aliyê Swîsreya fransî bi tevayî cudatir be. Dîsa cudayiya di navbera bajar û gundan de jî dibe ku pir mezin be. Tevî vê yekê kevneşopiyên li giştiya Swîsreyê derbasdar jî hene.

## Silavdan

Em li Swîsreyê wiha silavê didin hev: Em piranî destê xwe didin hev û li çavên hev dinêrin. Mêr û jin jî li çavên hev dinêrin. Em li Baselê dibêjin "Griezi". Ger mirov hevûdin baş dinasin, ew dibêjin "salî" an jî "hoi". Mirov li gundan, gava hev nas nekin jî, li kolanê silavê didin hev.
Li Swîsreyê hurmetdayîn girîng e. Ji ber vê yekê em gelek caran dibêjin spas "Danke" û spasxweş "Bitte". Wek mînak, em li dikanê yan jî li xwaringehê pir caran dibêjin spas "Danke" û spasxweş "Bitte".

## Birêkûpêkbûn (deqîqbûn)

Li Swîsreyê birêkûpêkbûn ango çûnûhatina di dema hatiye diyarkirin de, bi taybetî jî li ser kar, girîng e. Ger hûnê zêdeyî 5 xulekan (deqîqeyan) dereng werin, ji kerema xwe ji berê ve agahiyê bidin. Hûn dixwazin hin kesan bibînin? Wê demê ji berê ve dema hevdîtinê (Termin, randevu) diyar bikin.

## Danûstendina nerasterast

Em li Swîsreyê rexneyên xwe pirî caran rasterast nabêjin. Em bi piranî tenê îşaretekê dikin. Lê tevî vê em wiha dihesibînin, ku kesa, kesê li hember me ev rexne fêhm kiriye. Ger hûn hîn baş bi almanî nizanibin, ev yek bi taybetî ji bo we zehmet e.
Ji bilî vê, em carina ji devjengî û pevçûnê direvin. Ger cîranên we wek mînak, hest pê dikin, ku tên acizkirin? Wê demê dibe ku ew bi xwe neyên ba we, lê belê ji we re nameyekê binivîsin. Hûn ji xwe ne bawer in, bê we ew rast fêhm kiriye? Wê demê ya baş, hûn careke din bipirsin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gut-zu-wissen/li-swisreye-jiyana-bi-hev-re